
Xanî mêlag (isbat) dike.

"Ma mirov zaroyê xwe yê nexaş bi za-

royê cîranan yê xaş diguhêre..?"

Diyarîya me "YEKBIN" 42 helbestên û di hundirê (100) rûpelan da hatîye, lê rênasê me di malkên xwe yên nazdar û menreban da xwe dide ber çavan ko ew lawê demêye, lawê gelê xwe ye, bê rawestan (seknandin) nobadarê rêzanîyê ye, çavnirîna xwe herdem li bûyerên cîhanê ye, li şoreşên azadiyê ye, wêneyên mezin ji serkewtinan werdigire (distîne) loma (ji ber vê) tu nav baştirîn û girîngtirîn ji navê "YEKBIN" ji diwana mera nikarî bidiya. Helbestvan dibêje: "Min dî bê yekbûn rê naçin serî... serketin çênabin, loma min ji banga: YEKBIN" tişt nedî." Têmen bingehîn li cem evîndarê azadiyê, dijminê setemkarîyê, pêşengê civa kê xwe, "Gundî" welat û wekhevîye.

Helbestvan rewşa hemû aliyên û diyardeyên jîyan a gele xwe bi gelemperî (giştî) û bi awayekî dilgirî nîgarkiriye û daniye ber çavan howeyên (sedemên) şûndamanîna jîna rebenan, hejran bi şorên xweşik û wêjeyî dide xuyakirin. Şûnketina glên setembar (bindest), çewsandina çîne karker bi hebûna impiyalistê û segên wê yên parêkar û rastgû ve bi kîr girêdide, rola çekên wan şermeze dike. Gundî dibêje:

"Mepirsin ji ku tîr çekên kuştin û talanan

Mepirsin ew diçin ku,

Mepirsin li kune bazarên çekan."

Ev nîmûneyên ronahî me neçar dikin,

ko em navê "Gundî" dînin kêlek (rex)

helbestvanên rêalîst.

Eger em çend tîbîniyan li ser çarçe -

wên wêjeyî bêjin, em nikanin ewqas sa

mana (servet) wêjeyî bipesinin, wek

pêjin (xeyal), lêgirtin, lê tevî vê

em li hin şûnan lêgirtinên gelek xweş

û ciwan dibinîn.

Evîndarê azadiyê dibêje:

"Nemane çêla şîr jê didoşin,

Emê bişewtînin tariyan

Emê xewnên reş texin gornan."

Lê bi rastî hûnana rîfma (dawîya mali kan) di helbestên Gundî da bi hunermendîyeke zor heşem û xweşnewaz li hev latîye. Gundî mamostê xortane, dengêkî nûjenbare, xameya wî (pênivîsa wî) çak û çalake. Tewfîq Hekîm gotîye:

"Şêwe bi xwe mirove". Gundî jî bi awa yî nivîsandina xwe, dil û ceger jî sîngê xwe derxistine û weke kizotên ê gir li ser rûpelên dîwanê bêdereke jê avakiriye, dûman û kel jê radibin, di ber çavên mera derbazdibin, şopa wan bê gûman wê di hundirê meda bîmîne û dendikên serbestiyê di gulistana weje ya Kurdî da biçînin, gulên geş wê şîqin bidin.

"YEKBIN" axê ziya telbîz dike, daran avdide, latan ji pêşîya rêka me bi hêrs radike, xewkiriyan hişyar dike, xûnê sor û niştimanperwerî berdide tamarên heval û hogirên xwe, nexmaşbûna tera û merabûna Kurdan bi dermanê yekbûnê dizane. Kî dizane û texmîndike, ku helbestvanê me wê hîn çi fêreyên hişmendî bide zarên gelê xwe. De bila gotinê mamostan berba nebe... De bila rêça me rêça wî be. De bila zaîngeha me dewlementirbe. De bila "YEKBIN" li xortan pîroz be...

\* Tê binî

1) Bêlînskî : 1811-1848 Şoreşger û dê mokratakî Rus bû, rexnevanê lêteretûrî bû û feylesof bû.

2) Tewfîq Hekîm : 1898, El-Iskenderiye (Mısır), nivîskarekî navdar û me-zine.

# KONGRA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTAN LI SWÊD PÊKHAT

Di 4-5 û 11'ê meha Çirîya Paşîn da Federasyona Komelên Kurdistan li Swêd kongra xwe ya sêwemîn bi serfirazî pêkanî. Di kongrê da 51 nunerên komelên endam û gelek mêvan amade bûn.

Kongre bi rawestina bîranîna şehîdên Kurdistanê û pêşverûyen Cîhanê destpêkir. Ji bo rêvebirina kongrê 3 kes wek endamên dîwanê hatin hilbijartin. Ji bo guhrandin û serastkirina destûrê komîsyonek hate damezrandin. Rapora sîyasî, rapora xebat û aborîyê ji kongrê ra hate pêşkêşkirin. Di rapora sîyasî da, bi taybetî li ser rewşa gelê kurd û tevgera wî hate seknan din. Dîsa di wê raporêda grîngî û pêwîstîya yekîtiyê û tevkarîya welatparêzên kurdistanê li Swêd, di nav federasyonekî da hate diyarkirin. Her sê rapor ji aliyê kongrê hatin rûspîkirin.

Nunerên komelan li ser xebatên federasyonê dîtinên xwe gotin. Li ser wetenî û dijwarîyên federasyonê, li ser rola federasyonê ji bo kurdên li Swêd û her usa ji bo şerê azadiya gelê me dîr û dirêj hate seknandin. Di nav hinde axiftinan da bang li wan ke sên ku bi tu komele an jî rêxistinêva grêdayî nîn hate kirin, wekî ew jî ji bo xurtbûn û serfirazîya federasyonê piştgirîyê bikin.

Ji bo Komîta Karger (Yönetim kurulu) 7 endamên esîl û 2 çîgir û ji bo Komîta Çavdêr (Denetleme Kurulu) jî 5 endam hatin hilbijartin. Bi daxwaz û pêşniyaran va dawîya komcivîne hat.

Federasyona Komelên Kurdistan li Swêd, carek din di nav hemû hêz û kesên welathiz da hêvîyeke xurt, daxwazeke bilind, ji bo yekîtiyê peydakir.

Komela me, ji destpêkê hetanî niha

di federasyonê de cîkî xurt girtîye û dê viya berdewam bike. Ji bo yekbûna hêzên welatperwer çî ji destê me bê emê pêkbînin. Xurtkirina federasyonê, yek ji armanca me ya herî girînge. Em di wî bîr û bawerîyê da ne ku, bê yekîtiyeke xurt xelasbûn ne mumkune. Bê yekîtiyê, gavên xurt ne mumkune. Federasyonê yekê baş eşkere kirîye, bawerîya yekîtiye xurtkirîye, li hember dost û dijmin dengê gelê me hêxurttir bûye.

- Bijî Federasyona Komelên Kurdistan li Swêd.

- Bijî Yekîti

- Bimre Emperyalîzm, Kolonyalîzm û Faşîzm.

# SIN'ET Û ÇAND

## JI GUNDA GUNDEK

Hevalên hêja,

Ez ji wera vê hîkayete (çirok) ku mamoste yê mezin Hecîyê Cindî Cewarî nivîsîye. Hecîyê Cindî di sala 1967 an pirtûkek bi navê "HEWARÎ" (pirtûka çîrokan) nivîsîye û di rûpela pêşînda di bêje: Ez vê pirtûkê "pêşkêşî 50 sal-ya Revolyûsîa Oktyabrêye sosîalîsmî -êye Mezin dikim". Belê, pirtûk ji vir panzdeh salan berê hatîye nivisandin, lê bi bîr û bawerîya çîrokên pir xweş têde hene. Min ji wan çîrokan yekî "JÎ GUNDA GUNDEK" bi tîpên latînî nivîsî û pêşkêşî Redaksiyona ROJA NU di kim. Pirtûk bi tîpên kirîl hatîye nivîsandin. Pêwîste çî ji destê me bê em teksir nekin.

Silavên şoreşgerî

### Navdar

Sibeke havînê çike sayî ez bi xizmetekê rêketim, çûme gundê Kûrekendê, wekî dinê bi cûrê kin û fêmdarîya teze jêra dibêjin Kûreken-Kûreken. Gundî li binatara girekîdane, ne aqa durrî Erêvanê, li nehya Zemîadzîne, weke pêncî-şêst malîye. drêje, li alîkî wî lod, gom û tewlêd kolxozêne, lê ê dinê dighîje mekteba gund. Jêra gundra ceweke avêye tenik tê, nerm dikîşe di çê, lê çarhilqê wê û lnava gund rewş girtine darêd sêva, hurmiya, zerdela û guza, şivtela û sinca... Gund dixemilînin.

Binellêd wêderê berê, çawa navê gundra dixwêne, Kurekend, gundê kûrê wextêda adirbêcan bûne. Mezelê dorê ji şedetîya wê yekê didin. Lê niha gişk kurmancin, cişîhitî sala hezar nehsid hijda. Ew tevî xebatçîêd Ermenî hatine ji Qersê, gundîê şatiroglî êne. Sûzîs û Bacelûê, hatine. Ji alîê Tendûrekê, sînekê gundîê Zorêne, qûçê, hatine alîê Wanê.

Gund Xuri, Sipkî yanê Hesinî nine, çava ku berê bû gundê zuquriya, hesinîya, sipka û usa gişk ji hevdu başqe başqe dibûn. Naha ji nava cmaetê berebere têne birkirîne qebil û berêd ze manê çûyi hezar navi. Naha gişk yekî, binellê gundekine, bi navê gund tenê naskirîne. Çî guhastîneke mezin.

Kûrekend si û çend sala berê xra-be bû, mekênê bûmê kor, guhêre pezê paziya dereng û bihara zûhati hukumeta Sovyêtie guhdari da ser wê qijî lê ji: şênkîr, kîre ber planê, bî tipa teze, dewsa axîla, guhêrêd pêz- otaxêd tezeye çendpencere çekîr û avakîr. Rêncberê berî bere-bere bi rîatiêra hat grêdanê, hêja bû xwevê gund, kewşen û avê... Û Konê Hizkîrî bî çit û berçitê xweva, wekî tevi kolozê terîki hê bin stêrê hne malada dimînê, her cara, gava çevê meriv pê dîkeve,

xûna reş hildîşe nava dîl û hînavê wî, derd û kulê kevn tev radîvîn. Tê berçeva emirê berê reşî-hîş, şerêd qebilaye bavo-bavo, hewar û gaziê, halê kuştîne, qîrkîrîne, talan û tajan..

Û iro, ew rojê qetlê, ku wextekê he bûne, diha derbazbûne, unda bûne û ma-neçawa xewnerojkê reş, wekî meriv tucaranaxweze bine bira xwe, çîma ku xweda hêrs dibe, dîkewgire, dişewite weke agirê tendûrê.

Kûrekendîya gişke kolxozedanin û tevî kolxozvanêd gundê Haytaxêyî cînar, dostê kal û bava, pembû, tîrîya bax û reza, bostan û pincarê bêcer dikin, oncê hitînin-datînin. Xwelîya deşta Erêvanêye tevda zêr, xebatçî -êd xweye tezera gulvedide, dixemile bi gûşîêd trîêd şîrine cinetî, bi hezar turle-temî....

Li Kûrekendê dersdarîê dike Romîê Heso, Kalekî rûspî, wekî mayîn jêra dibêne- Romî Gaso, bi forma ûrisî. Me-na wê yekê heye hibet û serhatîya wî camêrî gelekî dirêje, lê emê zef kin bêjin. Hela berî Revolyûsîa Oktyabrê Romî ser gilîkî netê tê sîrgûnkirîne. Wî dişînin heylo ser sînorê Ûrîsetê û Çînistanê. Ew Kurdê serê çîyê xerîbî nenas, li cîkî usayî durr, îda halê wî wê çawa be.? Û Romîê me bîlûrê li ser lêvêd wî bîr tîne bala xwe, der-cînara, çîyaê Elegezê, azaê, derd û kulê xwe têda dirêje. Hergê ne dengbêj bûye, teze dibe dengbêj, hergê ne bîlûrvan bûye, dibe bîlûrvan. Xwe bi xelqê dora wxe dide naskirîne û bi xwe jî dîkeve kirasê wana, dîkeve nava halê Sîbîr-sîrgûnîê. Belê, Meriv hîn dibe, teyax dide... Û sal tîn derbaz dibin, yek, du, sê... Romîê Heso xwe jî tê dernaxe, çîka çawa hîni zîmanî ûrisî bû û çawa hîni nivîsar û xwendinê bû, ew ku bi dîne ezdîya xwendin gune hesab dibû. Gune hesab dibû, gava meriv ji milletê dinê bizewicîya, lê Romî ew der jî kir, qîzeke Ûris- Anji Sergêv na stend û xwera li welatê durr dibê xweymal. Lê pey Revolyûsîa Oktyabrê vedigere tê bal qewmê xwe, cem bira û pizmamêd xwe û dibe derdarekî pêşîn nava dersdarêd Kurdêd Ermenîstanêda. Vê gavê, îda şagirtê wî- Rzalîê Reşîd wekî kilûba gundda dixebite, xilaskîrîye înstîtûta pedagogîêye dîreke. Romîê Heso yî dinêdî, bîranîneêd hezarene serîda, niha li gundê Kûrekendê, li rex elegeza hizkîrî, dersa zîmanê ûrisî kur û keçêd teze rabûyî hîn dîke wî zîmanî, bi kîjanî nivîsîne Pûşkîn, Tolstoy, Gorkî û Şoloxov. Ewî bexte-ware weke dinyakê, ne axir ew qe na kalbûna xweda gihîşte mirazê xwe, ne ku tenê hîn bû, lê nihe jî dîke wê cî maeta xwe.

Cmaetê xwe li xwendinê girtiyê, li kûltûraê, ronaê.... Û vaye, hema eva gundê me Kûrekend-li vê derê herçê bû cahil, qîz be, kur be kesekî nexwendî tune. Li her malekê kîtbê hene, qelem, kaxez û têne pesinandinê ew meriv, êd ku rind dixûnin, xwendinêda pêşîn, gelekî dixûnin û gelek zmana zanin.

Qonaxa min li mala Reşîde ya bavê Rza. Reşîdî yekî zerîni navîne, heye pêncîpênc salî, aqilê wî çevada dixwêne, xweşxebere, nîvxwendî maye.

Xem tune, ez ber dilê wîda tîm, binhêre, kurê te ghîştîye ku înstîtut xilaz kirîye, lê kurapê te Keleş, li Le nîngadêda bûye ulmdarekî berbiçev, gelek kîtbêd wîyê ulmîê hene, gelek xwendîkar û aspirant li ber destê wî hîn bûne û hîn dibin, îda çî dixwezî?

Ew raste, hilbet, Reşîd li min vedi gerine, -lê ne axir min bi xwe jî dixwest kûraya zanîne dest banya, axir hukumetê her mecalmikan dane me bona pêşdaçûyîne, zanebûnê, û hîsreta xwendinê dîlda, ew, wekî îda nîv qurneyî (sedsal) zêdetir emir kirîye, li nevîngê xweyî ber bistin dinhêre, meriv hew zane ew dixweze bikeve nava dîlkê wî, Bêje: ez ji rîya xwe mam, qe nat tu mey dana ulm û zanîne destê xwe neke.

Ne vîê wî berê xwe radîoa fêza xweda dîke, meriv dibê dixweze bibhê. Lê kalik-Reşîd, pencerara derwa dinhêre, têne xanekirîne mîrg û zevîêd rasta ortê Haytaxê û Kûrekendêye hêşîn, qîçîk, nexş-nexşî. Beşerek ser hinarêd sûretê wîra derbaz dibe û... weke bîstêkî em li hevdu dinhêrin. Tê ber çevê min xebata wîye hizemetî û bi xeberda na çeva ez dibêjim te sehet xweş, xebatçîyo, ew xebata te kirîye li nava deşta kolxozê, ne ku tenê pesnê te dibe, lê usa jî pêşdaçûyîna me hesab dibe.....

Min texmîn kir, wekî Reşîd dilê min xwend, femkir, ku rêke zefe dirêj qedan diye ji tekmalîê heta kolxozê... beşer lê xweş bû, te digo gulû nûr jê dibar-yan.....

Belê, li vî gundî kesek para nanêrê, pey roja buhurî nakeve, gişk pêşda din hêrin-roja sibê û siba tezera teze dîbin, emirê xwe xweş dikin, bî sercem, dewlemend û bextewar dikin, berbirî sba xweye teze dibin, siba komûnîzmê.

baştarafî sa.1'de

Avrupadaki kitlelere yönelik geniş bir haber ve eylem gazetesi olma gibi önemli bir görevi başarıyla sürdürüyor, o halde eksikliği hala doldurulmamış olan sanat ve edebiyat yayını Roja Nu vasıtasıyla sürdürmek için hiç bir engel yoktur.

İsveç son zamanlardaki yoğun göçlere rağmen, Kürdistan'ın her dört parçasından ancak dört bin insanımızı barındırıyor. Almanya ile kıyaslandığında da sözü bile edilmez. Ama öte yandan sosyal ve kültürel imkanları en ileri ülke.

Elimizden geldiğince bu imkanları kullanarak, bu alandaki boşluğu doldurmaya çalışacağız.

Saygılarımızla.

ROJA NU REDAKSIYONU

# BİRANINA KURDPERWAREKÎ MERD

Ev salekê zêdetire, ku ji nav me çû maqûlekî hêja, Kurdekî dilsoz, Kurdperwarekî navdar, serê pêşkinîya Xelîlê Çaçan Mûradov. Em çi bêjin bêjna siyarê me tê. Ew ji piştê gelê Kurd çû. Şîna wî bû şîna gelê gişkî.

Di nava Kurdada mirovên jêhatî û aqil pir hene. Lê eger zanebûna wan bi gel re naê girêdan, kara wê zanebûnê gel re tune, ne tişteke. Jîyana Xelîlê Çaçan bi temamî ev tişt bûn. Bî rastî ji bo gelê xwe kar bike. Ew ji wê razî ji vê cihanê çû, ji ber ku çiqas karîbû ji bo gelê xwe xebitî. Lê ne bi dilekî rehet serê xwe danî ax û berê sar, ji bo ku gelê xwe bi temamî azad ne dît.


Belê, hozanê mezin dinav me çû, lê karê wî pir mezin ji bo gel ma heta hetayê. Ji bo vê hindê jî gava li Kurdistanê, an jî Awropaê ser mesela Kurdên Sovîetîstanê gotina dikin, berî her tiştî navê Xelîlê Çaçanî remêtî tînine ser zara. Wek navê pêşmergeên xehreman, wek navê pir Kurdên dilpak.

Ser mesela X.Çaçan û mala wî kovar û rojnemên Kurdîye Rîya Teze, Dengê

KOMKAR, Roja Kurdistan Roja Nu Muzîk û hunur da çap bûne, bendên wî kovar û rojnemên Azadî, ên Ermenîstana Sovîet, Rizgarîya Kurdistanê rona hî dîtine. Em her tenê çend gotina bê jin û hinda jî serda zêdekin. Xelîlê Çaçan Mûradov 24 sal hîmdar û serokê radîoa Kurdî bû, di jîyana xwe da ji bo gel 1400 sitiranên Kurdî, 40 pîes (têatro) da nivîsandin û ew kire milêkê gelê Kurd. Çend pirtûkên folklorî pêşkêşî gel kir, mala xwe kire mêvanxane ji bo Kurdên Kurdistanê û Awropaê, endamê mala xwe bi wijdana Kurdeyê tîe mezin kir. Bermalîya wî Eznîva Reşît, 26 sale ku dîktora (peyvkar) radîoa Kurdîye. Wî çaxî di nava jinên Kurdada bes tenê ewê zanibû Kurdî bi-xwîne. Ber destê jin û mîrên bextiyar pir Kurd fêrî Kurdî bûn. Wana lawekî wek Têmûrê Xelîl dan, ku niha şîna ba vêda berpirsyarê Radîoa Kurdîye li Rewanê. Sê zarokên vê malêye mayîn, Sêdar, Gulnare û Uladîmîr çend pîesên Kurdîda dilqada wek artist dilîzin, Sêdar û Têmûr çend sala bûne endamên Komela Xwendevanên Kurd li Ermenîstanê.

Belê, zuret û bedena bavê Xelîlê Çaçan-Çaçanê Mirad, şîne ji vê malê 16 Kurdên bi xwendina bilind derketine. Li nava hîç malên Kurdên Sovîetîstanê haqas pir mirovên, ku înstîtût û ûnîversîtêt temam kiribin derneketine.

Roja 13'ê Novêmbêr (Cotmehê) sala 1981'ê, birînek jî ser gelê Kurd zêde bû, Te qey digot Kurdistan Hejîya. Û wê rojê hemû Kurdperwerê Sovîetîstanê berevî mala mamostaê mezin Xelîlê Çaçan bûn û paşê cinyazê wî hil-dan, birin gundê Kurdayî Emrê teze (jîyana nu) binax kirin, veşartin, li wî gundî, kîderê ew 58 sala berê ji diya xwe bûbû. Sê roja şîna Kurman cî hat kirin û ew hemû şîna ser geytana magnîtofonê (dengnivîsokê) hate nivîsandin. Wê rojê li gund berev bûbûn dewsgirtîê Şewra (Sovêta) Ermenîstanêye here bilind, endamê Komîtêa Navbendî ya Partîa Ermenîtanêye Komûnîst, berpirsyarê rojnema Rîya Teze Mîroê Esed, Mîrxasê Yekîtî Sovîet Semendê Elî Sîabendov, hewarîên ji Komera Gurcîstanê, bajarê Tblîsî serokê Sêksîona Nivîskarên Kurda Baxçê Îsko



Xelîlê Çaçan Mûradov

seroka (Rêktora) ûnîversîtêta Kurda ye gelêrîê Jênnya Zurbe, serokê Komela Xwenkarî Kurd li Tblîsî Yûraê Şamil, ji Komera Qazaxîstanê hatibûn roşinbîrên Kurd Sertîvê Mûsa û doktor Bedoê Eloyî, pir Kurd hebûn ji Komera Sovîetîeye mayîn.

Ser besela şîna gel gotinên serxwe şîe nivîsandin kovar û rojnemên Kurdî ye Komkar, Roja Nu, Rîya Teze, Qêrîn rojnemeke Ermenî, Muzîk û Hunuz, Roja Kurdistan, radîoên (pêlweşên) Tblîsî û Rewanê gotin kirin. Ji Kurdên Sovîetîstanê, Kurdistanê û Awropaê bi serda name, têlêgram, hatin sitandin. Wek ji Cegerxwîn, M.E. Bozarslan, ji hemû komele, Fêdêrasîon, partîên Kurdî, ji rêdaksîonên kovar û rojnemên Kurdî, ji Mehmet Mele Kerîm, Qanatê Kurdo, ji hemû Kurdzanên Sovîet, ji Partîa Komûnîsta Iraq, ji radîo têtatro, nivîkar û rojnemevanên Kurdên Tblîsî û ji pir mirov û teşkîletan. Li gorîstanê pir mirovan, wek helbestvanê mezin Fêrîkê Usiv, roşinbîrên Kurdên Komerên Sovîetîstanê, qîmetekî he ja dane Kurdperwarê bîrewar. Ji gotinê wana çend liba em jêrê didine çapkirin.

## GOTINA MAMOSTAÊ MEZIN BÎ NAME

"Hevalê payedar û bilind Têmûrê Xelîl, Piştî silav û pesin û pîrsyarîya rewşa we, ez bi dilekî xemgîn serxweşîya te û mirovên te, heval û hevkarên Xelîlê Çaçanê xwedê jê xweş dikim û bi wera ji bo mirina heval Xelîl-wî peyaê paye bilind xemgîn û dil tijî kul û ah û kovan dibim.

Heval Xelîlê Çaçan Mûradov stêreke geş û ronî bû û şevreşa rewşa welatê meda ji ezmanê torevanî qurîjî û bi carek wînda bû. Lê hîvîdarim ku xortên wek te û bîrewarên Kurdên Sovîetîstanê bi gernasî şîna wî bigrin.

Heval Xelîl serê xwe danî, lê navêkî mezin û malbeteke hêja û payedar di şîna xweva hîştin.

Hêvîdarim ku tarîxa jîndarîya heval Xelîl dîr û dirêj bê nivîsarê û ji mera ji mera bihêlin, ku tarîxa Kurdistanê di rojekê da fireh û payedar û bilind bibe.

Heval Xelîlê Çaçan ji ber çavê me wînda bûye jî, lê bê gumane wê her û her di nav dilê gelê Kurdistanêda jîndar û payedar bimênî.

De, xwedê wî di bihiştêda, di qata jorinda dilşad û rûgeş xwedî bikî".

Heval û dilxwezê we- Cegerxwîn

Gotinek Li Gorîstanê ji Navê Kurdên Gurcîstanê

"Gelî bira û pismama, sed koranî bona mîrê çê. Mîrê ku jîyana xwe da pêşketina çanda gelê Kurd, Ew yek, ku ûro Kurdên Tblîsî di wanê çanda Kurda da pêş ketine, wî karîda emekê Xelîl bira pire".

Qisa Bîranîê Tevî Hevalê Min

Me te disparte ax-bera, Xelîl,  
Pêşberî Elegezê Kaw-kubar,  
Gişka dikirin şîna-girî, nelîn  
Kerbî birîna teye dilxedar...

Wermebaê wî Elegezê te  
Digirîya, ser te dikir live-liv,  
Bira û pismam, kes-kinêzê te  
Ji şîya ser te mabûne miqûf

Xwedîya êr-misken tera bû bêşê,  
Elegez-dayka, ku dike lûrîn,  
Mirina te bû kul, derd û dilêşî,  
Xelîlê minî aqilî nûzîn.

Tu çûyî qebrê bi rêke kese,  
Dilê te ne bir derd û kulê ber,  
Tu bûyî xudêkaki ter-teze  
Li dû xwe hîştî zuret û devter.

Qisa min tev te ret nabe tu car,  
Dilê minda bûye dimîm û delîl,  
Geş û genc bûyî, bi dil û dîndar,  
Lema ser te em dineliyan, Xelîl.

Ji Hmayak Manûkyan, Fêrîkê Usiv wergerande Kurdî.

Ev Xelîlê Çaçane-viz  
Paldaye bê Deng û hes  
Ê ku belayî dinê dikir  
Kêlm û kilam, deng û bês.

Fêrîkê Usiv

## Yılmaz Güney

baştarafı son s.

Ne var ki, tarih deşikendir. Tarih, Ankara'nın sömürgeci-faşist celtlatlarına göre şekil almıyor, karar vermiyor, gelişmiyor... İşte, Yılmaz Güney' in tarih sahnesine çıkışını, YOL filminin doğuşunu bu gerçekte ara mak gerek. Açık konuşalım, bugüne değin "YOL" gibi politik içerikli bir film yapılmamıştır. Sömürgecilerin her şey olup bitti, sandığı bir anda bir Kürt rejisör tarih sahnesine çıkıyor ve bir çırpıda Kürdistan'ı bütün dünya sinemalarına taşıyor... Yılmaz Güney, altmış yıllık bir oyunu bozup, Kürdistan gerçeğini işleyerek hem de en canlı, en çarpıcı bir şekilde ve de sinema dünyasının en büyük ödülünü alarak, sömürgecilerin yüreği ne korku salıyor...

Batı Avrupa film eleştirmenleri bu gerçeği unutmamalıdır. Bir filmi görmek, yaşamak, duymak yetmiyor. O filmin yapıldığı ülkelerin gerçeklerini, ilişkilerini, sorunlarını da bilmek gerekiyor. Tüm bunlar bilinmeden yazılanlar, söylenenler havada kalır, pek önem taşımaz...

**KÜRT REJİSÖRÜ**

## YILMAZ GÜNEY: "YOL POLİTİKTİR"

Kürt yazarı ve gazetecisi Mahmut BAKSİ, geçtiğimiz ay İsveç Televizyonu ve Radyosu adına Yılmaz GÜNEY ile bir görüşme yaptı. Televizyon ve Radyonun geniş bir şekilde yer verdiği bu görüşmeye, İsveçin bazı günlük gazeteleri de tam sayfa ayırdılar. Sosyal Demokratların sabah gazetesi Stockholm Tidningte yayınlanan Baksi'nin bu makalesini Türkçeye çevirerek okuyucularımıza aynen sunuyoruz.

Roja Nu

### MAHMUT BAKSİ

" - Bu filmde özellikle, çok uzun tarihi geçmişi olan Kürt halkının mücadelesi hakkındaki yasaklamalar, kısmi de olsa belgelendi. Çünkü Kürt halkının gerek varlığı ve gerekse O'nun yaşadığı ülkenin sömürge karakteri gözardı edilmiştir. Şurada ( YOL'da ) en belirgin bir biçimde biz, Türkiye'de sömürge Kürdistan'ın varlığına parmak bastık. Ve O'nu bütün dünya kamu oyuna sergiledik. İkincisi, biz Kürt halkına değil, Kürt halkını tanımayanlara, Kürt halkının altında bulunduğu baskıları bilmeyenlere, O'nun altında bulunduğu baskıları gösterdik. Yoksa, bizim Kürt halkına "Bak sen baskı altında bulunuyorsun" deme gibi bir sorunumuz yok. O zaten baskı altındadır. Bunları hergün yaşıyor," bana diyen Yılmaz Güney, konuşmasını şöyle sürdürüyor.

" - Biz YOL filmiyle, Türkiye ve Kürdistan'dan insan manzaraları çizdik. Bir gerçeği belirttik. Ki, buna bir çok insan tepki duyuyor. Örneğin YOL filminde Kürdistan'ın belirtilmesi, özellikle şoven yapılı bir yığın insanı küplere bindirdi. Ve bana hain damgasını da vurdular. Ben burjuvazi tarafından her zaman " hain " ilan edildim. Her zaman " Halk düşmanı " ilan edildim. Bundan hiç kırıklık ve üzüntü duymuyorum. Bana eğer halkım hain deseydi, ona üzülürdüm. Oysa bu gün halkım beni kucaklamış ve bana sahip çıkıyor. Tabii bunun doğal sonucu olarak, burjuvazi bana saldıracak. Bundan daha doğal bir şey olmaz."

Yılmaz GÜNEY'e göre, her tavır politik bir içeriğe sahiptir. Bu filmin de tavrı politiktir.

" -Ancak, diyor Yılmaz GÜNEY, bir sanatçı olarak herhangi bir sorunu ortaya koyarken, onu kuru slogan düzeyinde değil, yaşıyan acıların üzerine inşa edince, o daha etkin ve daha yumuşak görünüyor. Bu, onun siyasi karakterini kaybetmesi anlamına gelmez...."

Yılmaz GÜNEY çok haklı bu konuda. Özellikle, YOL filmiyle ilgili, Türk basınına izleyenler, YOL'un ne denli politik bir içerik taşıdığını, neyi amaçladığını hemen görmüşlerdir. Bunun



Mahmut Baksi, Yılmaz Güney ile

en belirgin örneği, Milliyet Sanat Dergisinde, Atilla Dorsay'ın yazısında görülüyor. YOL'u Paris'te seyreden Dorsay, özetle şöyle diyor :

" -YOL hemen söylenmeli, bir sinema başyapıtı, sinemanın son yıllarda gerçekleştirdiği en güçlü filmlerden biri. Film gücünü, çeşitli düşünsel akımların, entellektüel kaygıların, biçimsel araştırmaların, öz-biçim dengesi ve ilişkisi tartışmalarının at oynattığı dünya sineması içinde yalın ve özlü bir sinema olmasından alıyor. (...)Ömer'in serüveni, köy halkıyla ölümleri sahnesinde tüyler ürpertici bir trajik güce erişiyor. Mehmet Salih'in aile bireyleriyle olan ilişkileri, burjuva romanının hele günümüzde tümüyle unuttuğu, en azından yapay bir düzeyde ele aldığı bu ilişkilere (Yunan trajedileri, Shakespeare, Corneille, vs) temel bazı ikilemelerini anımsatan kıvrımlar getiriyor, vs..."

Gürüldüğü gibi eleştirmen buraya kadar YOL' u göklere çıkarıyor. Ama bu kadar sanatçı gözükken, sanatı bu denli bir duyarlılıkla okura sunan Bay Atilla Dorsay, filmin esas içeriğine geldiğinde birden şoven, ırkçı kesiliyor. Çünkü artık burada onun için sanat bitmiştir. Şoven ve inkarcı duyguların kusması söz konusudur. Onu kusacaktır. Dorsay yazısını şöyle sürdürüyor.

" - Ama YOL'da yanlış bazı şeyler de var... Filmin yüksek sinemasal düzeyini zedeleyen bazı şeyler... Bunlardan biçimsel biri, Ömer'in geldiği yörenin, perdeye yansıyan yazılarıyla "Kürdistan" olarak gösterilmesi... İyi, güzel de Türkiye'de Kürdistan diye bir yöre mi var? Biz, Türkiye'nin doğusunda yaşayan Kürt vatandaşlarımızın

olduğunu biliyoruz, ama Kürdistan diye bir yörenin varlığından haberi biz yok. Yılmaz Güney niye filmine böyle bir yöre adı koyma gereğini duymuş? Yılmaz Güney, zaten sırtında taşıdığı çeşitli suçlamalar varken, bir de "kürtçülük", "bölücülük" gibi günümüz Türkiye'sinde hiçbir aklı başında insanın, hiç bir ilerinin yüklenmediği, yüklenmek istemeyeceği ve de yüklenmeye çalışıyor, veya böyle bir suçlamaya gidebilecek şeyler yapıyor? Yılmaz Güney, dışarda iken bu günkü yönetimin karşısında gözükmeğe dikkat etmişken ve YOL'da da bu konuda açık ve dolaysız hiçbir eleştiri yokken, bir " Kürdistan " lafıyla midele ri bulandırmaya, filmi izleyen herkesi rahatsız eden bir tavra girmeğe Yılmaz Güney'i iten nedir? Biz, Yılmaz Güney'in sanatçı, sinemacı kişiliğine ve filmlerine olan hayranlığımızla bu tür bir davranışı arasında hiç bir ilişki kurmadığımızı, birini yücelttiğimiz ölçüde diğere karşı olduğumuzu anımsatalım..."

İşte, Kenan Evren'lerin, sömürgecilerin, Yılmaz Güney'e öfkesi, kızgınlığı buradan kaynaklanıyor... Altmış yıldır Türk burjuvazisi, Türk sömürgecileri, Kürdistan'ı coğrafyadan silmek, Kürt halkını ortadan kaldırmak için devletin tüm olanaklarını bu yolda kullanmışlardır ve de kullanmaktadırlar... Çünkü Kürdistan sorunu, Kürdistan sözcüğü bugün gerçekten Türk hakim sınıflarının, emperyalistlerin korkulu rüyasıdır. Ankara'nın taşını, toprağını temelden sarsacak olan bu sorunun yok edilmesi, faşist cunta için, hakim sınıflar için hayati önem taşıyor...

Arkası Sa. 7'de



**ROJA NU**

ORGANA KOMELA KARKERÊN KURDISTAN LI SWÊD

XWEDÎ : KOMELA KARKERÊN KURDISTAN LI SWÊD

ADRES: BOX 4038 141 04 HUDDINGE- SWEDEN

Ji MEHÊ CAREK DERTÊ BUHA 5 KRON HESAP NO : PG 45 89 80 - 0